Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2022
Sayı/Hejmar/Issue: 6
*e-ISSN 2717-8315*
*Doi:10.55118/kurdiyat.1203607*
*Rûpel/Sayfa Page: 49 - 71*

# LI HERÊMA CULEMÊRGÊ HESABA HESABDARAN Û MIŞTÊ

Kerem ENGİN

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types: Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research Article
Dema Hatinê/Makale Geliş Tarihi/Received: 13.11.2022
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/: 08.12.2022
Kerem Engin, Yüksek Lisans Mezunu Hakkari Üniversitesi
kengin_cevizdibi@hotmail.com
Orcid: 0000-0002-8339-6092

Atıf: Engin. K. (2022). "Li Herêma Culemêrgê Hesaba Hesabdaran û Miştê", Kurdiyat, 6, 49 - 71.
Citation: Engin. K. (2022). "The Account of Accountants and Miştê/Occupancy in Hakkari Region", Kurdiyat, 6, 49 - 71.

**Kurte**

Teqwîm di jiyana civakan da cihekî girîng digire. Civakan çalakiyên xwe yên jiyanê li gor guhertina dem û wextan bi kar înane. Guherîna wextên salê li ser xebat û kedkarîya civakan yên debarî bandorek zêde çêkiriye. Her herêmekê li gor teqwîmekê hesaba xwe ya sal û wextan pêk înaye. Herêma Culemêrgê jî li gor teqwîma Rûmî hesaba xwe bi kar înaye. Hesapadarên Herêma Culemêrgê çalakiyên aborî, rênçberî û kedkariyê li dûv rewşa demsalan bi cih înaye. Serê salê û heta dawiya salê li gundan û heta bajaran civaka Kurdan jî li gor hesaba hesabadarên xwe ji bo jiyanê xwe amade kirîne. Koçeran, gundîyan û kesên li nav çiyayên asê jiyana xwe domandî, roj û heyv û stêrk ji bo xwe kirîne nîşane. Wextên salê bi hişyarî û dîqet hesab kirîne. Pêwîst bû berbihar, cotyarî, gîyadûrîn, malbarkirin, berxbir, giyakêşan, dexildûrîn, bêder û heta dawet û şahîyan jî di wextê xwe da hatibane kirin. Heke ev xebatê di wextê xwe de nehatibane kirin, wê salê ew dê bikevine di nav alozîyê de û ji ber sermahîyê û birsîtiyê jiyana xwe ji dest bidin. Mal û heywanên wan ne bêne telîftin. Derheqê barîna befir û baranê, firtone û barovê de hesabdaran texmînên xwe kirîne. Ji bo hesabkirina dem û wextan û debarê mezinan gelek gotin û serpêhatî veguhastîne. Hesabadarên xwecihiyên Culemêrgê jî li gor erdnigarî û rewşa hewayê herêma xwe hesab û texmînên xwe kirine. Li ser vê hesabdariyê di lîteratûra Herêma Culemêrgê da çandeke qedîm hatîye avakirin. Em dê di vê xebata xwe da behsa hesaba hesabdarên Herêma Culemêrgê û ew gotinên mezinan yên derheqê vê mijarê de gotin bikin.

**Peyvên Sereke:** Hesaba hesabdaran, Rewşa hewayê, Teqwîm, Miştê, Zimhêr, Debare.

## Hakkâri Yöresinde Hesabdarların Hesabı ve Miştê/Doluluk

**Özet**

Takvimin toplum hayatında önemli bir yer vardır. Toplumlar yaşam mücadelesini ve ekonomik faaliyetlerini vakitlerin değişmesine göre icra etmişlerdir. Vakitlerin değişmesi toplumların ekonomik faaliyetlerine fazlasıyla etki etmiştir. Her bölge yıllık faaliyetlerini bir takvime göre yapmıştır. Hakkâri bölgesi de yıllık hesabını Rumi takvime göre hesaplamıştır. Hakkâri bölgesinin hesabdarları ekonomik, rençberlik ve çalışma takvimlerini yıllık hava durumuna göre planlamışlardır. Kürtler gerek köylerde yaşamış olsun, gerekse şehirlerde yaşamış olsun, yılbaşından yılsonuna kadar, kendi hasapdarlarının tahmin etmiş oldukları hesaba göre hayata dair hazırlıklarını yapmışlardır. Göçebeler, köylüler ve muhkem dağların arasında hayatını geçirenler güneş, ay ve yıldızları kendilerine işaret olarak görmüşlerdir. Vakitleri bilinçli bir şekilde ve büyük bir dikkat ile hesaplamışlardır. Bahara çıkma, ot biçme, evleri yaylaya taşıma, kuzu kırpma, ot biçme, ot taşıma, tahıl biçme ve harman yapma işleri ve hatta düğün ve eğlenceler dahi bir takvime göre yapmışlardır. Eğer bu faaliyetler zamanında yapılmasaydı, onlar büyük bir badirenin içine düşmüş olacak, hayatlarında ciddi problemler ile karşı karşıya kalacak, açlıktan ve soğuktan hayatlarını kaybedecek, malları ve hayvanları telef olacaklardı. Hesabdarlar kar ve yağmurun yağışı, olası fırtınalar ve zemheriler hakkında tahminlerini yapmışlardır. Vakitlerin hesabı ve hava durumu ile ilgili olarak birçok söz ve hikâye söylenmiştir. Hakkâri bölgesinin hesapdarları da kendi bölgesinin hava durumuna göre tahminlerde bulunmuşlardır. Hesabdarların yapmış olduğu hesaba göre bir literatör oluşmuş ve Hakkâri'de kadim bir kültür meydana gelmiştir. Biz bu çalışmamızda Hakkâri bölgesindeki hesapdarların hesabı ve konu ile ilgili büyüklerin sözlerinden bahsedeceğiz.

**Anahtar Kelimeler:** Hesapdarların Hesabı, Hava durumu, Takvim, miştê/dolu, erzak, maişet.

## The Account of Accountants and Miştê/Occupancy in Hakkari Region

**Abstract**

The calendar has an important place in the life of societies. Societies have carried out their activities related to life according to a calendar. The change of seasons has affected the business life of societies. Each region has carried out its annual activities according to a calendar. The Hakkâri region is also the age of its annual activities according to the Rumi calendar. Calendar calculators in the Hakkâri region carried out studies on their economic activities according to the weather conditions of the seasons. From the beginning of the year to the end of the year, the people of the region made their preparations according to the calculations of the people we call "Calculator (Hesabdar)" from the villages to the cities. The beginning of spring, agriculture, mowing, nomadism, etc. They have made themselves the guide of the day, the moon and the stars to carry out activities such as agriculture. They used their time carefully and made their calculations accordingly. The onset of spring should have been done on time, until farming, mowing meat, nomads, shearing lambs, gathering grass, making hay, weddings and entertainment. If these activities had not been carried out in time, they would have created serious difficulties in the lives of those people and they would have faced death. then both they and their animals would perish. For this reason, they were making predictions about the precipitation of snow and rain. A literature has been formed about the people's own calendars, rain and snow, and many words and stories have been told about these activities. These people, whom we call "Calculator (Hesabdar), made the weather according to their own experiences and forecasts. An ancient culture has occurred in the literature on this account. In this study, we will try to convey the words of the elders about the accountability in the Hakkari region and the stories among the people on the subject.

**Keywords:** People's Calendar, Weather, Calendar, Miste, Food, Feed

## Destpêk

Hesaba hesabdaran/teqwîma Kurdî/Rûmî ji zemanên qedîm heta îro ji bo me bi devê hesabadarên Kurdan ve hatîye veguhestin. Xelkê Kurd li welatê xwe jîyana xwe domandîye û her wesa jîyana xwe ya civakî û aborî jî li gor teqwîmekê raborandîye. Xelkê Herêma Culemêrgê jî li zozan û gund û bajaran bizav û xebatên xwe yên civakî û aborî li gor pergala teqwîma Rûmî/Kurdî hesab kirine. Xelkê herêmê li gor rewşa hewa kar û barê xwe kirîye û xwe pêk înane. Çalakîyên rênçberîyê ligel vê teqwîmê bi cih înane. Her falîyeteke aborî û civakî teqwîmek, yanî wextek hebûye. Dema ew teqwîm derbas dibû hêdî ew şol û emel nedihate kirin. Her wesa dema ew wext nehatiba û wî şolî biken mifa ji wî şolî û wê kedê newergirtin. Lewra her şolek bi wextê xwe ve girêdayî bû. Dê ji bo vê çendê mînak bêne dayîn. Wextê cot û kêlanê, gîyadurînê, dexildurînê, giyakêşanê, barkirinê, berbiharê, payîzewaran û hwd. hemî bi teqwîmekê ve girêdayî bûn. Li gor hesaba hesabdaran her demsalekê şolê xwe yê teybet hebû, cot û kêlan û çandinî biharê dihatine kirin. Wextê cot û kêlanê dihatine kirin, heke nîv roj jî di ser re çûba ew çandinî nedigihişt.

Xelkê herêmê jiyana xwe li deşt û zozan û gundan derbas dikirin, ew însanên rênçberî û ketkarî dikirin, wan çi mekteb û medrese nexwandibûn, ew kes li deşt, dol, neval, çiyan, zozan, zevî û li ser bêderên kadînê jîyana xwe derbas dikirin. Nîşanên wan yên wextzanînê stêrk, roj, heyv, befir, baran, bager, av, teyr û cûcik bûn. Wan bi awayekê zanîstî ilmê felek û erdnasiyê jî nexwendibû. Belê ew bi çavdêrî û tecrûbeyên xwe ve zimanê xwezayê fam dikirin. Dema stêrkekê xwe nîşa wan daba, bager radibû û dengê xwezayê ji dûr ve digihişte guhê wan, ew têdigihîn û dizanîn ka xweza ji bo wan çi dibêje. Ew însanên rênçber li ber beroka giyadurînê, li nav zevî û cot û kêlanê, li ser bêdera dexil û kayê şol dikin awazê rewşa hewa fam dikirin, çi îlmê zanîstî di destê wan însanên rênçber da nebû, lêbelê ew û xweza zimanê yekûdû fam dikirin. Lewra wan û xwezayê her gavek li gel hev derbas dikirin. Xweza wesa hatîye afirandin ku hewcedariyên heyberan hemîyan bê kêmasî bêne qedandin. Lewra di xwezayê da hêmanên jîyanê hemî hatîne afirandin. Wan xweşî û nexweşiyên rewşa hewa bi îşaretan ve dizanîn. Ev îşaret ji bo wan kesan wek qasidan bûn. Ev qaside jî hindek caran sterk bûn, hindek caran dengê bagerê bû, hindek caran ewrên reş bûn, hindek caran jî befira serê çîya bû. Her wesa xelkê herêmê yê li gundan dijîn û rênçberîyê dikin îro jî wek bab û kalên xwe li ser hesaba hesabadarên xwe çalakîyên xwe didomînin.



Em ê di ve xebata xwe da her mehek di kîjan demsalê da cihê xwe girtîye û wê mehê kîjan qelp[1] tê da hene û mezinan çi gotin li ser wê qelpê û wê mehê ve gotîne dê behs jê biken. Me xebata xwe li Herêma Culemêrgê li sehayê kir. Piranî li Culemêrg, Gever û Çelê rûbirû/dîdar pirs ji hesabdaran kirin û wan jî bersiva me da û agahîyên xwe yên derheqê vê mijarê da ligel me parve kirin.

Hesabadarên em ligel axiftîn agahîyên wan piranî wek yek bûn, bes hindek caran jî, agahîyên wan didane me ferq û cûdahî tê da hebûn. Me ew agahîyên li herêmê piranî hatîne qebûlkirin esas wergirtin. Dîsa ew gotinên mezinan yên li ser qelp û mehan hatîne gotin, cih bo cihî ji jêk cûda bûn, bes wateya wan gotinan wekî yek bû. Ew gotin jî me ji wan veguhastin. Ew hesabadarên ku me hevdîtin ligel kirî û agahî jê wergirtîn me di çavkanîyan da nîşa dane.

1 Qelp tête wateya rojên nexweş ku befir û baran dibarît û bagera bi gelek bihêz têt.

Derbarê vê mijarê di lîteratûrê da bes me meqala Engin KORKMAZ[2] dît, ew xalên ew li ser nerawestayî em li ser rawestayîn û em awayekê berfirehtir li ser sekinîn. Me li ser qelp û mehan çend versîyonên cûda jî veguhestin. Dîsa me behsê nîşan û texmînên rewşa hewa kirin û mînak li ser înan. Salên dumahîyê da ew çacdarî tecrûbeyên hesapdaran ber winda bûnê ve diçin, divê ev tecrûbe hem bêne qeydkirin, hem jî nifşên nû derheqê vê çandê da bêne agahdar kirin. Milletek bi çand û hûner û tecrûbeyên xwe ve dimîne jîyanê da, heke ev çande winda bû ew millet jî dê winda bît. Mebesta me ya vê xebatê ew e ku ev mîratê qedîm berze nebît û ji bo nifşên taze bibîte rênîşander da ku çanda bab û kalên xwe binasin û sûd jê wergirin.

**1. Nîşan û Texmînên Rewşa Hewa**

Wek tê zanîn zemanê berê wekî roja me teqwîm û agahîyên zanîstî nebûn û derheqê rewşa hewayê da pêşveçûnên îro nebûn. Însanên berê li gor çavdêrî û tecrûbeyên xwe hereket dikirin. Teyrik, kew, çûçik û stêrkan wan hem rewşa hewa, hem jî wextê salê dizanîn. Ev e wek qasid û hişyarkerekê û nîşanan bûn ji bo wan însanan. Em dê li xwarê behsê çendekan ji van nîşanan bikin. Eve wek nîşanên tebiî ne. Ev nîşanen li gerdûnê bi şiklekê tebiî hatîne afirandin, ev e perçeyek ji hebûna gerdûnê ne. Gerdûn bê van nîşanan jîyanê di xwe da nahewîne. Ew kesan hem revşa hewa, hem jî wextê salê bi van nîşanan ve dizanîn. Em dê li xwarê behsê van nîşanên tebiî bikin.

**1.1. Teyrê Pîroz**

Di efsaneyan da teyrikan cihek girîng heye. Hindek caran teyrikan ji bo mirovan mizgînî înaye, hindek caran di navbira mirovan da name înane û birîne û qasidî kirîne.



Teyrek heye dibêjinê “Teyrê Pîroz”. Bi tenê digere, xelkê cihî vî teyrî ji bo xwe kirîne nîşanek. Dema ev teyr dîçû rexê/alîyê evraz û çîya ev e nîşana xweşîyê bû, dema ev teyr ji çîya dihat û xwe nizim dikir û diçû gelî, rewşa hewa nexweş dibû, wê gavê xelk da bêjît: “Xwe hazir biken û tedbîra xwe wergirin dê hewa nexweş bît û dê barît” (Ölmez, 2020).

**1.2. Organên/Lebatên Leşê Însanî**

Însan gelek tiştan bi lebatên leşê xwe ve dizane ku ew jî penç hest in. Însan bi van penç hestan ve esehîya tiştan dizane. Ew jî tamkirin, bêhnkirin, ditîn, bihîstin û lêdan in. Ji ber hindê insanan bi van lebatan ve rewş û texmînên hewa zanîne.

Dema guhê însanan dicemidîn dizanîn ku dê serma çêbît û dê barît. “Babê min çû ji derve da pîyên xwe bişot, dema hatî got: guhê min dicemîdît, dê barît, dema bûye şev berf barî” (Ölmez. 2020). Disa xelkê pezê xwe biribû pişta gundî, nabeyna meha gulan û xizîranê da bû, serê êvarê bû, mezînê gundî got: “gepê/difina min dicemidît, xwe hazir biken dê befir barît, wextekê kurt di ser da çû, befirê lêkir/barî, heta befir li pişt çûkê mirov diket” (Er, 2021).

**1.3. Dûkêla Barînê**

**Însanan bi hatina ba/bagerê ve rewşa hewa zanîye. Ba ji kijan aliyî ve hatiba wan dizanin**

2 Ev meqale di civîna zanista civakî ya Ahtamarayê 2018’de hatîye pêşkêş kirin.

**ka rewşa hewayê dê çawa lê êt. Ji ber hindê cihê şevba lê daba xwe jê dûr têxistin.** Şevbayê[3] xweşîyê jorda diçît, wextê dûkêla borîya sûbê di jorî da diçû, xelkê dizanî ku dê rewşa hewa xweş bît. Wextê dûkêla bûrya sûbê lêk zivirîba wan dizanî ku dê barît (Şen, 2022).

### 1.4. Gaçerîn

Nîşaneke hatina biharê jî Gaçerîn bû, ev çuçike mizgîniya biharê û xweşîyê bû.

Gaçerîn çûçikek e, hatîna wê çûçikê nîşana biharê ye, ev çûçik ji alîyê deştê ve dihate herêmê (Şen, 2022).

### 1.5. Quling

Quling jî teyrek e xelkê herêmê bo xwe wek nîşanekê dîtîye. Xelkê herêmê quling jî wek mizgîniya hatina biharê dîtiye. Dengê kaz û kulingan ji bo bajêriyan wek mizgîniya biharê bû.

Quling jî curêkê ji teyran e, ev teyr jî wextê biharê ji deştê ve dihate herêmê. (Şen, 2022) li Culemêrgê dibêjinê "Kaz û Kuling". Dema kaz û kuling li ser bajêrî dihat û çû dengê wê li ser bajêrî diket. Dema direng hatiba bihar jî direng dihate herêmê (Şimşek, 2022).

### 1.6. Kewê Koçer

Du cureyên kewan li herêmê hene, kewek xwecihî ye, yek jî dibêjinê kewê koçer. Dema payîz nêzîk dibît kewê koçer herêmê terk diket. Wextê bihar hat carek din kewê koçer dizivirîte herêmê.

Payîzê kew diçîte rexê Badînan û cihê germ. Wextê nevrozê dizivirîte herêmê, heman demê de eve wextê zîpane jî, dema befir helîya, ew befir diçîte nav ava rûbarî û wî demî kewê koçer li Badînan ew ave vexwar dizanît ku eve ava befirê ye û bihare, vêca kew jêlil tête herêmê. Meha gulanê kewê nêr diqebît û dixwûnît, dema ev kewe qebîba/xwandiba xelkê dizanî wextê barkirina zozana ye, vêca xelkê karê zozanan dikir (Şen.2022). 53

"Gulanê gulanê

Kewê nêr dxwûnît li deşta xwanê

Wextê bikeyn karê zozanê" (Şen, 2022).

### 1.7. Hacî Reşk

Hacî Reşk jî ji cureyeke wan teyrikan e ew yên xelkê herêmê bo xwe wek nîşanek hatina biharê di dîtîn.

Teyrikek heye digotinê Hacî Reşk. Ev teyrik reş bû. Dema bihar nêzîk dîbû dihate herêmê, sibehan wextê gundî radibûn, dîtin ku hacî reşkêt hatîn, keyfekê xwe li gundîyan dida ku Hacî Reşkêt hatîn, lewra hatina Hacî Reşkan mizgînîya biharê bû (Engin, 2022).

### 1.8. Serhejandin û Guhlêdana Pezî

Herêma Culemêrgê piranî cihê pez xwedankirinê ye. Ji ber hindê xelkê umrê xwe ligel pezî borandî ye. Bi çavdêrî û tecrûbeyên xwe ve bi hereketên pezî û heywanan ve zanîye ka rewşa hewa dê çawa bît.

3 Bayê şeve têr dibêjinê şevba.

Zivistanê li nav dûnhê[4] pişta pezî di bû befir, wextê êvarê pez dibirine govê, gilîlkên befirê û cemed pêve çêdibûn, da roja paştir bîte sahî û xweşî (Demîr, 2022).

### 1.9. Qijik

Qijîk jî ji wan teyrikan e ew yên xelkê ji bo xwe kirîye nîşan**ên rewşa hewa. Rengê wê reş û spi ye, dengê wê xweş nîne.**

Heke qijik diçûne rexê roj helatê rewşa hewa da xweş bît, heke êvarê qijik jorda ji bo rojava çûbana, da barît û da bîte nexweşî, ji ber ku jorda diçûne cihê germ (Demir, 2022).

### 1.10. Ewrên Sor

Di zanîna rewşa hewayê da ewran jî cihê xwe heye. Guherîna rengê ewran, xusûsên heke zivistanê ewrên sor hatibana.

Heke zivistanê wextê êvarê ewr rexê rojava sor bibana, wê gavê roja paştir da bîte xweşî û sahî (Demir, 2022).

## 2. Miştî û Hesaba Salê

Li gor hesaba hesabdaran/teqwîma rumî sal duwazdeh mehin. Adar, Nîsan, Gulan, Xizîran, Tîrmeh, Tebax, Îlon, Çiriya ewil, Çiriya dumahîyê, Kanûna ewil, Kanûna dumahîyê û Şuwat.

Adar 31, Nisan 30, Gulan 31, Xizîran 30, Tîrmeh 31, Tebax 31, Îlon 30, Çirya ewil 31, Çirya Dumahîyê 30, Kanûna ewil 31, Kanûna Dumahîyê 31, Şuwat 28 roj in (Kizilkaya, 2022).



Xelkê herêmê li gor hesaba Rûmî teqwîma xwe bi kar înaye, bes rewşa hewayê herêmê gelek teybetiyên xwe hene, ji ber hindê xelkê herême gelek cihan da li gor teybetmendiyên cografya xwe teqwîma xwe bi kar înaye. Serê Kanûna ewil/biçûk çile[5] destpê diket, çile bîst roj ji Kanûna ewil, bîst roj jî ji Kanûna dûmahîyê/mezin in. Berçe[6] jî deh roj ji Kanûna dûmahîyê, deh roj jî ji reşeme/şuwat in. Li gor hesaba Rûmî zivistan 88 roj in. Bihar 84 roj, havîn 102 roj, Payîz jî 91 roj in. Piranî li Herêma Culemêrgê zivistan serê çile destpê diket. Bes li Herêma Culemêrgê li gor hesaba hesabdaran hindek cihan zivistan berî serê çile dest pê dike. Hindek cihan zivistan 120 roj, hindek cihan jî heta 141 roj dikêşît. Xelkê herêmê jî ji bo zivistanê xwe li gor heasaba xwe ya teybet hazir diket. Ev e hesaba miştê ye. Li gor rewşa hewaya herêmê ev hesab tête guhartin, zivistana Herêma Culemêrgê hemî gava li gor hesaba Rumî nayête hesabkirin, li gor destpêka miştê tête hesabkirin. Zivistana li gor miştê[7] tête hesabkirin ji zivistana teqwîma Rûmî dirêjtir e. Xelkê herêmê jî li gor miştê kar û barê zivistanê dikêt û alifê heywanan û zimhêrê xwe wek hesaba miştê hesab diket. Dîsa li herêma Culemêrgê cih bo cihî zivistanê guhartin dikevîtê. Cihên wekî Geliyê Tîyarê zivistan yazdehê Kanûna ewil dest pê diket, heta serê meha nîsanê dewam diket. Cihên wek lêwîn û feraşînê zivistan hindek caran nivî çiriya dûmahîyê dest pê diket û heta dehî meha nîsanê jî dewam diket. Li gor miştê 30 rojên biharê ber zivistanê dikevin. Bihar bi vî

4 Dûnhe zivistanê li nav zevyan di nav befirê da ji bo pezî cihek çêdikirin, subê heta êvarê pez li wê derê dima, pez li vê dûnhê xwedan dikirin.

5 Çile çil roj in, çile da serma zêde dibît.

6 Beçe bîst rojên piştî beçen e, serma beçe jî zêde ye, heta gelek caran sermaya beçe ji sermaya çile zêdetir e.

7 Miştê, serê zivistanê û heta xilasbûna zivistanê hindek kesan pezê xwe teslîmî hindek mirovan dikir da ku bo wan xwedan biken. Ji bo vê çendê jî her pezekê qederek pare jê werdigirt.

şiklî dibine 51 roj. Bes hejmara rojan hem li gor hesaba Rûmî, hem jî li gor hesaba miştê havîn û payîzê wek yek in.

**3. Bihar**

Demsala biharê ji sê mehan pêk têt. Adar, nîsan û gulan. Bihar nehê adarê dest pê diket, heta sih û êkî gulanê dewam diket. Adar 23, nîsan 30 û gulan jî 31 roj in. Bi vî şiklî demsala biharê jî 84 roj in.

**3.1. Adar**

Meha adarê bihar destpê diket, belê dîsa befir jî dibare, ew befra dibare xwe zêde li erdî nagire.

"Meha adarê destpêka biharê ye.
Adarê befirê havête gulya darê
Serda hat hewayê biharê
Nema heta êvarê" (Geverî, 2022).

Dîsa di gotina xwarê de jî befra meha adarê befirek demkîye, xwe nagire û zû dihele.

"Adarê adarê
Befir hat heta gupka darê
Xwe negirt heta êvarê" (Seven, 2022)

Ew befira heta danê êvarê dibarît hemî dihelît û xilas dibît. Meha adarê bi befr û şilove diborît û car xweş e car nexweş e. Car digirît car jî dikenît, car ewr in car tave ye, hem xweşîye hem jî dibarît. Dema tave hat wek biharê ye, dema ewr hatin wek zivistanê ye. Adar di demekê kurt da taveye, heman demê da dibîte ewr û dibarît.



"Xox ne dar e
Adar nebihar e
Jin dotmam e
Ya dî yar e" (Er, 2022)

Dema meha adarê hat rewşa hewayê germ dibît û befir dihelît. Vêca rêka befirê xwar dibît, her wesa ar û debare kêm dibît. Veca mezinan ev gotina xwarê gotîye.

"Adarê
Rê xarê
Av û arê" (Kızılkaya, 2022).

Ji ber ku meha adarê destpêka biharê ye, car car rewşa hewa sar dibît û befir têtin. Meha adarê wekî dar xoxê ya nazik e.

"Adar ne bihar e
Xox ne dar e
Kiç ne war e" (Kızılkaya, 2022).

Disa di versîyonek din da jî meha adarê huşa înane ziman. Yanî bihara meha adarê wekî yarekê ye, ji bo mirovî ya emîn nîne. Yar keyfa xwe bi mirovî xweş diket û berze dibît.

“Adar ne baihar e
Xox ne dar e
Jin dotmam e
Ya dî yar e” (Engin, 2022)

Gotinên xwarê de jî meha adarê teşbîhî dara xoxê û zeviyeka beyar kirîne. Zevîya li ber derî ya mirovî ye û mirov mifa jê werdigirît, bes zevîya dûrî mala mirovî bît, wek zevîya beyar e, dûredest e, mirov neşêt mifa jê wergirît.

“Adar ne bihar e
Xox ne dar e
Jin dotmam e
Zevîyên ber derî milke
Ya dî beyar e” (Seven, 2022)

Disa gotina xwarê de meha adarê meşk tête kiyan, bes ne li cihê zozanan, cihê deşt û germ bît. Ji ber hindê ev gotîne.

“Adarê
Meşkil darê
Ne li vêrê
Li Berya Şingarê” (Er, 2022)



Dema meha adarê hat, av diçîte bin rihên darê û heta serê darê digerye, ev tişte jî bi harîkarîya Xwedê milyaket têtе xwarû û vê wezîfê bi kar tînît.

“Adarê milyaket hate xwarê
Av çû gulya adarê
Nîşanek ji ya biharê” (Kızılkaya, 2022).

**3.2. Newroz**

Çendan meha adarê ji mehên biharê jî bît, dîsa zivistan jî xwe tê da nîşa didet, meha adarê çend qelp[8] têda hene. Nehî adarê roja newrozê ye. Roja newrozê şev û roj wek hev dibin. Tave wekî yek li nizar û berojan didet. Befra nizar û berojan wekî yek dihelît.

“Newroz ne nîzar e ne beroj
Dê şînbîn gulet bişgoj
Newroz e ne şev e ne roj e
Ne nizar e ne beroj e” (Kızılkaya, 2022).

Bi hatina newrozê ve şev û roj wek yek lêtên, tave wekî yek li nizar û berojan didet. Newroz wek mizgînîya biharê hatîye dîtin.

“Newroz e çi şevê çi roj e
Hem nizar û hem beroj e
Mizgînîya biharê ye
Çend rojek xweş û pîroz e” (Geverî, 2022).

8 Qelp, barîna befir û baran û rabûna firtona ye.

Çawa însan bi çavdêrî û tecrûbeyên xwe ve dizanît roja nevrozê guhertinekê li ser rewşa hewayê çêdiket, her wesa heywanetê kûvî/wehşî jî dizane ku hewa hate guhûrtin û hewa germ bû. Hirçên beroj û nizaran di kunêt xwe da derdikevin û vê rewşê temaşe diken.

Hirça nizarî û hirça berojî roja newrozê derdikevin, hirça nizarî[9] berê xwe dide berojî û derdikevît, lewra beroj reş e, hirça berojî berê[10] xwe dide nizarî ku befre, kevîne, kerove ye û naderkevît. Ji ber hindê hirça nizarî berî hirça berojî derdikevîte koçerîyê. Nehî adarê roj ji hemî roja geştir e, dema rêving çûne rê çavên wan dikevine befrê, tingavtin, çavên wan têşan, hindî ku roj hind ruhn û geş e dikevîte befrê û dibirisqît, misqalêt wê dikevine çavêt mirovan û çavên wan têşin. Roja nevrozê piştî nivêja êvarê roj dizivirît û dikevîte şetê Mûsil, wê gavê şetê Mûsil birq daye. Nehî aadarê nêçîrvanan û ehlê çîya li lata dahûlê şetê Mûsil temaşe kirîne, lata dahûlê dikevîte navbira Ertûş û Xanê da, ser serê wê latê Badînan dibînin, li wê latê dîtîne ku şetê Mûsil birq daye (Kızılkaya, 2022).

### 3.3. Hejdehê Adarê

Her çend meha adarê ji demsala biharê jî bît, zivistan xwe têda nişa didet. Qelp têda hene. Qelpek jî ji wan, "hejdehî adarê" ye. "Hejdehî" ji bo hejdey adarê tête gotin. Mezinan çend gotinek li ser hejdey adarê gotîne.

"Hejdehî adarê
Melekê Ezdan hate xwarê
Nîşanek yêd biharê" (Kizilkaya, 2022).



Ev befira meha adarê dibarît, na mînît, di gavekê da dihelît, di meha adarê da çend befir bibarît jî heman rojê da xwe nagirît. Ji ber hindê ev gotine hatîne gotin.

"Hejdey adarê
Hejde bihost befr hatine xwarê
Neman heta dane êvarê
Hejdey adarê
Hejde bihostêt be
Rê hatine xwarê
Nema heta danê êvarê
Ema lêrê ne berya şingarê
Gisk kuşte binê adarê
Kewek li serê aadarê" (Kızılkaya, 2022).

### 3.4. Nîsan

Nîsan jî ji meheka demsala biharê ye. Meha nîsanê zexîre çêdibît, debare û zimhêr kêm dibît û hêdî xwarin dest nakevît. Debar û xwarin serê salê heta nîsanê hatîye xerçkirin, hem debara heywanan, hem jî zimhêrê xawrinê kemasî dikevîtê, ji ber vê yekê gotinên xwarê pêve hatîne vegotin.

9 Wateya nizari ew e cihê sîber ku tavê nebînît, hirç cihê/kuna xwe li nizarî çêdiket, ji ber hindê gotînê hirça nizarî.
10 Wateya berojî jî ev cihê ber tava rojê, hirç cihê/kuna xwe li berojî çêdiket, ji ber hinde gotîne hirça berojî.

"Nîsanê kire serê salê
Roj bûne sal
Zik bûne çal
Kabanî û malxwê mane betal
Eyal maye bêhal" (Kızılkaya, 2022).
Meha nîsanê gul û binefş şîn dibin, meheka xweş e, teşbîhî kiçka ser kirine.
"Nîsan dibêjît ezim kiçka ser reş
Cih û cihbaran şîn dibin binefş
Nehe ez im di nav mehan da xweş" (Kızılkaya, 2022).
Li herêmê Zivistana Geverê dirêjtir e, meha nîsanê taze deşta geverê reş û geş dibît.
"Heyva nîsanê geş bû
Deşta Geverê reş bû" (Geverî, 2022).

**3.5. Avetîrk/Avetîk**

Çendan meha nîsanê ji biharê bête hesapkirin jî, dîsa qelp tê da hene. Qelpek jî avetîrk[11] in. Di avetîrkan da befr û baran li gel hev dibarin, dema kete erdî wek şulovê lê têt, yanî dilopa wê tîr û giran dibît, dema dilopa avetîrkan dikevîte erdî çipik vediden, ji ber hindê gotîn wan baranan avetîrk. Hindek herêman herfa "r" êxistîye gotînê avetîk. Dema avetîrk destpê kirin, ew dara kulîlk dayî sir lê didet. Êkê nîsanê serê evatîkan e. Hindek jî dibêjinê stêrezarka nîsanê. Yanî avetîrk û stêrezerk eynî tişt e. Avetîrk heft heta deh roj in. Gelek caran avetîrkan da befir zêde barîye, li Herêma Culemêrgê avetirk deh roj jî têne hesapkirin. Avetîrk an çar roja dê barîn an jî dê sê rojan barîn. Her wesa an ji serê avatîkan dê barîn an jî dê dumahîya avetîrkan barîn. Cihê Culemêrgê heft rojên avetîrka jî ji zivistanê hatîne hesapkirin. Dema xelkê Herêma Culemêrgê kare zivistanê diken, divêt hesaba heft/deh rojên avetîrka jî biken. Heftê nîsanê paşve cih bo cihî ferq dikevîtê, wekî yek nîne, hindek malan pezê xwe dida miştê piştî hingê paşve xwedanê pezî dihat û pezê xwe dibire ve. Hindek cihan jî avetîrk deh roj hesab dikirin. Hindî wextê mişte bû, ew kesê pez xwedan dikir ji wî pezî mesul bû. Piştî heftê nîsanê pez dibirine ber biharê. Cihên bilind zû reş nedibûn û çere zû neçêdibû ku pez bixwet, ji ber hindê pez dibirine cihên gelî û cihen germ ku bihar hatî û çere çebûyî, da kû pez bête xwedan kirin.

"Berbihar Çend rojek bûn.
Stêrezerka nîsanê
Gîya li kunebanê
Avetîrkêt nîsanê
Qelpeke ji yêt zivistanê" (Şen, 2022).

Li gor gotinan di avetîrkan da pîrê pezê xwe birîye û çûye zozanan, befr û baranê destpê kirîye û hewa nexweş bûye, pezê pîrê hemî qir bûye û pîrê ev gotine gotîye.

"Hindî avetîrk li nav mehan bin
Zozan li pîrê heram bin" (Mengeş, 2022).

11 Avetîrt ew baran in ewên deh rojên serê meha nîsanê dibar in.

Barîna baranên avetîrkan ji nîşanêt hatina biharê ye, heke baran li avetîrkan nebarin dê bihar direng kevît.

“Heke avetîrk bibarît bihare
Heke nebarît warek sare” (Geverî, 2022).

**3.6. Bist û Çarî Nîsanê**

Bîst û Çarî nîsanê jî qelpeke zivistanê ye. Gelek caran bîst û çarî nîsanê li Herêma Colemêrgîyan befir û baran barîye.

“Bîst û çarî nîsanê
Texe li qûnebanê
Gamêş hate qiranê” (Şen, 2022).

Bîst û çarî meha nîsanê li Geverê gamêş çûne garanê û çerine, bes roja baştir befir barîye û garan neçûye û gûnî veçirîne û ji bo xwarinê danane ber gamêşan.

“Bîst û çarî nîsanê
Şanedêra Zîzanê
Gamêş çûne garanê
Êvarê hatin roja dîtir gûnî dane” (Geverî, 2022).

**3.7. Gulan**

Destpêka meha gulanê wextê dexil çandin û cot û kêlanê ye. Divêt zû cotyarî bête kirin da ber baranên biharan bikevît.

“Baranêt biharan
Xeberî bidene cotyaran
Destê xwe sivîk bike
Bila we neêt keysê neyaran” (Geverî, 2022).

Di barîna biharan da mirov demekî kurt biçîte nik neyarên xwe jî dê îdare biket, lewra barînêt biharan gelek dirêj nînin. Bes payîzan hewceye ku miro biçîte nih mirovên ezîz û dilpêveh, da kû mirov mexdûr nebît.

“Baranên biharan
Herine nik neyaran
Baranên payîzan
Herine nik ezîzan” (Engin, 2020).

Bihare/dexlî li Geliyê Tîyarê serê meha adarê diçînin. Dumahîya meha xizîranê jî didûrîn. Li herêma Lêwînê biharê serê meha gulanê diçînin. Hindek caran cotyaran piştî bistî meha nîsanê xilas bûyî dest bi cot û kêlan kirîne. Heke bihar xweş derbas bibît, xilasîya meha nîsanê û serê meha gulanê dest bi cot û kêlanê diken. Bes piranî çandinîyê meha gulanê diken. Çandina dexlî heta dehî xizîranê jî tête kirin. Bes ew dexlê wext borî bête çandin nagehît. Tecrûbeyên cotyaran ev tişte nîşa daye ku ew çandinîya di wextê xwe da neête kirin naçêbît.

Li gor van tecrûbeyan rojekê mirovekê cot kirîye, havalê wî jî gotîye: ecelê bike, ew dexlê danê siharê te çandî dê gehîtin, ew dexlê bo dane êvarê mayî nagehît û naçêbîtin. Ji ber gotina hevalê xwe wî cotyarî xetek di nîveka zevîya xwe dabirîye, çandina dane sihar û êvarê bi vî şiklî jêk cûda kirîye û piştî hingê zevîya xwe malû kirîye. Dema dûrînê hatîye nav zevîya xwe, ewê danê siharê çandî dûrîye, yê dane êvarê jî çandî ji ber ku neçêbûye nedûrîye. Heman demê de meha gulanê hazirî û kar û barên zonanan jî dikirin (Şen, 2022).

### 4. Havîn

Havîn jî ji sê meha pêk têt. Ew jî Xizîran, Tîrmeh û Tebax in. Derheqê van mehan agahî dê êne dan. Xizîran 30, tîrmeh 31, tebax 31 û ji meha îlonê 10 roj havîn in. Havîn 102 roj in (Kızılkaya, 2022).

#### 4.1. Xizîran

Dema serê meha xizîranê destpê kir, pêro[12] dê derkevin. Pêro komeka heft steran e, heta heftî xizîranê li esmanan têne dîtin.

Dema pêro derdiketin mezinan digotin: pezî bidene guhûrêt piştek da pez pêroya nebînin û da nedirsît. Her wesa wî demî pez derman dikirin, Lewra pêro stêraka zîq û geş bû, wextê pezî dîtiba dikete cafêt pezî û pez jê didirsa (Er, 2022).

Meha xîzîranê demê giyadûrînê ye, li gelyê tîyarê giyadûrîn serê meha xizîranê destpê diket, hindek caran li tîyarê hêj meha gulanê xilas nebûyî dest bi giyadûrînê diken. Mehekê giyadûrîn dewam diket, li herêma lêwîn û cihên bilind heyamekê piştî hingê giya didûrîn. Van cihan jî paletî û giyadûrîn heta heyv û nîvan jî dewam diket. Piştî hingê giya dibehin, hêdî naêne dûrîn. Gîyayê avî tê nebît, giyayê avî çend rojan piştî hingê jî tête dûrîn. Germa xizîranê zêde dibît, ji ber hindê xelkê gunda pezê xwe dibene cihên hûn û mala bar diken û diçine zozanan. Ji ber ku hewayê zozanan yê hûn bû.

“Xizîran hat û xizirî
Giya li mila kuzirî
Tiştek xwe li ber nagirî
Ji xeyrî dara berû û mêwa tirî” (Kızılkaya, 2022).

Meha xizîranê wextê çandina tûtinê ye. Dema tûtin diçandin xwe digirtin heta kirm/kurm xilas dibû, piştî hingê tûtin diçandin. Xelkê heta dehî meha xizîranê xwe digirtin, heke berî dehî xizîranê tûtin çandibana kirmî tûtin dixwar. Dehî xizîranê paşve ew kurim nedima û dimir. Ji ber hinde heta dehî xizîranê tûtin nedihate çandin (Şen, 2022).

Sêzdehê xizîranê roj radiweste û hêdî dirêj nabin. Roja herî dirêj sêzdey xizîranê ye.
“Sêzdey xîzîranê
Rojê berê xwe da zivistanê” (Şen, 2022).

#### 4.2. Tîrmeh

Serê meha tîrmehê binavê “terazî” komeka stêrka li esmanan derdikevîn. Terezî şeş ster in û

12 Pêro stêrek e li esmanî, meha xizîranê derdikevît.

birêz in. Terazî işareta hinde ye ku hêdî karê debar û zimhêrê zivistanê bête kirin.

Dema terazî derketin cot û kêlan naête kirin. Terazî cot bir in, dema terazî derketin hêdî çandin naênekirin (Er, 2022).

Navbira mehên tîrmeh û tebaxan zêde germ heye û xelk diçine zozanan.

“Nabeyna tîrmeh û tebaxê
Gurî radîbît ji axê
Xweş in zozanêt Şaxê
Badînan mewîj çûne miştaxê” (Kızılkaya, 2022).

**4.3.Tebax**

Meha tebaxê dûmahîya havînê ye. Hêdî wext ber payîzê ve diçît.

**4.3.1. Gelavêj**

Gelavêj navê stêrekê ye, dema gelavêj li esmanan derdikevît, rewşa hewa sar dibît, wî wextî li binê dara gûzê û hindek cihan kulîlkek derdikevît, dibêjine vê kulîkê “Canemerg”. Umrê wê canemergê rojek e. Gîyayek heye serê wî zîqe û qelem/stirî pêvene, dema Gelavêj derdikevît ev gîyaye dibişkivît û kulîlkan didet. Serê meha tebaxê Gelavêj[13] derdikevît. Bi derketina Gelavêjê ve hewayê dinyayê sar dibît. Dema heft roj tebax derbas bûn hewa dicemidît/sar dibît. Gelavêj pêş çavên temaşevanan ve dileyîz e. Stêreka birewneq e. (Şen, 2002) Dema Gelavêj derdiket piştî hingê celebên pezî diçine deştê. Heke kavir zû birîbana, dema celeb diçû deştê ji ber germê disotin. (Demir, 2022).

Li herêmê stran jî li ser gelavêjê hatîne gotin. Herdu mînakên xwarê ji wan stranan in ewên bi gelavêjê ve hatîne gotin.

Hilavêj û Hilavêj
Hatin pêro Gelavêj
Yarê nekirî nivêj

Ew pêro Gelavêj in
Ew cot in li esmanî
Xizêm qerefîl in

Ew cîranên didanî
Çûm da yarê ramûsim
Şol teqdîra rehmanî

Ew pêro Gelavêj in
Ew ligel subê kubar in
Xizêm û qerefîl in
Wêt ser difnê dabar in

13 Gilavêj jî stêrek e, meha tebaxê dirdikeve, dema ev stêre derket rewşa hewa sar dibe.

Çûm da yarê ramûsim
Şol teqdîrêt cebbar in

Selê kanyê dirêj e
Dema hat Gelavêje
Yarê nekir nivê je (Demîr, 2022).
Dîsa li herêma Culemêrgê strana xwarê li ser gilavêjê hatiye gotin.

Selê kanyê dirêj e
Ferşê kanyê dirêj e
Dema hat gelavêje
Yarê girt destnivêje

Selê kanyê mermere Ferşê kanyê mermere
Dema heyîv hat dere
Dostê kirî ya fere
Selê kanyê berîn e
Ferşê kanyê berîn e
Yarê helgirt mesîne
Dostê rêka te xwîne (Kaplan, 2015).



**4.3.2 Gunêla Pezê Kuvî**

Dema li esmana gelavêj derketin "gunêla pezê kovî" çêdibe. Pezê nêr diçîte dev pezê mê ji bo têkilîyên cinsî. Dibejine vê têkilîya pezê kovî "Gunêl". Dîsa ligel Gelavêjê nezîkî Payîzê "ewrên pêşemanan" jî tên. (Kızılkaya, 2022).

**4.3.3. Ewrên Pêşemanan**

Wî wextê salê hêdî zireet naête kirin û gîya naête dûrîn. Hêdî direnge sal e û  çi tişt naçêbîtin. Heke mirovek hez biket çandinîyê biket jî hêdî ew çandinî naçêbît, ji ber hindê ew kes pêşeman dibît ku çandinî nekirî û gîya nedûrî. Vêca pêşeman dibît. Belê pêşemanîya wî çi mifa nadete wî. Dema hêj Gelavêj nehatîn xelkê herêmê kar û barê zivistanê dikir. Divê heta wî demî herkesekê berhevî û kare zivistanê kiriba û zimhêrê zivistanê pêk înaba (Engin, 2022).

**5. Payîz**

Demsala Payîzê jî ji sê mahan pêk têt. Îlon, çirya ewil û çirya dumahîyê. Demsala Payîzê demê hasilatê û debare rakirin û komkirinê ye. Bîst roj îlon û herdu çirî heta yazdeyî kanûna ewil, 91 roj demsala payîzê ne.

**5.1. Îlon**

Heta dehî îlonê havîn e. Dehî îlonê havîn xilas dibît û payîz destpê diket. Ev rojê "eyde silîve" ye. Dehî îlonê dawîya havînê ye.

Îlon meha kewçerê ye. Meheka bi hesab e. Çend hesabên girîng di meha îlonê da hene. Hesabeka

di meha îlonê da tête kirin jî “beranberdana” pezî ye. Heftîya ewil ya îlonê beranan diberdene pezî. Roja beranberdanê jî di nav xelkê gundan û ehlê zozanan gelek bi keyf e. Wî wextî beranan di xemilînin û boye diken. Heftîya şuwatê ya ewil jî pez dest bi zanê diket. Hesabeka muhîm di nabeyna îlonê û şuwatê da heye. Heke berî îlonê beranan berdene pêzî, pêz dê di meha çile û beçe da zêt, wê gavê sir û seqem dê zêde bît, ew peza wî demê dizêt berxê wê dê telîfît, dîsa ji alîyê alif û gîya da jî kêmasî dê çêbît, lewra dema kitrê[14] didene berxan. Dîsa heke piştî meha îlonê beranan berdene pêzî ji bo biharê berx paş naçêbin û gir/mezin nabin. Lewra pez pênç meha avis[15] dimînît. Hesaba pênç mehan bi vî şiklî ne zû ne jî direng bi şiklekê baldar tête kirin.

“Îlon hat û ji wê ve
Mûno min neaxê ve
Firavîn wê di bi adarê ve” (Kizilkaya,2022)

Mastê meha îlonê jî gelek bi tam û xweş e. Piştî meha îlonê xelkê gundan teremastî[16] digirin. Teremast masyekê bitam e û pêxwarinek bi qîmet e.

“Mastê îlonê
Bidene xatûnê” (Er, 2022)

### 5.2. Çirya Ewil û Çirya Dumahîyê

**Çirya ewil û çirya dumahîyê mehên demsala payîzê ne. Wî demî xelkê gundan geniman diçinin, dara dikêşin û kar û barê demsala zivistanê diken.**

Hindek caran deh roj ji îlonê mayîn genimi diçînin. Daku genim ritlê[17] xwe biket û şîn bibît. Dema meha xizîranê digehiştê û nivî bû geniman didûrîn. Li gelyê tîyarê genimi didûrîn û şuna genimî birincî diçînin. Birincî jî radiken û piştî hingê dîsa genimî şuna birinci diçînin. Hindek caran çirya dumahîyê pazde roj dimînin befir dibarît. Bîst û pêncî çirya dawîyê “Şanedêr” e. Eve jî qelpek e, şeva şanedêrê dibû “Spîroj” (Şen, 2022).

Ji ber hindê kes nediçû rêvingîyê û nediçû cihekî dûr, heke wê rojê kesek ji mala xwe derketiba da kevîte tehlîka telifînê.

“Wêt hatin herdu çirî
Befir hat û kitîrî
Malxwê malê bejna xwe mirî” (Kızılkaya, 2022).

Dema herdû çirî destpê diken alifê heywanan û zimhêrê mirovan zêde heye, ev zêdehîye û berekete herdû mehên kanûnan jî dewam diket. Dema şuwat û adar hatin debare û zimhêr kêm dibin. Ji ber hindê gotîne:

“Herdû çirî mîrin
Herdu kanûn wezîr in
Şuwat û adar mehêt feqîr in” (Kızılkaya, 2022).

14 Kitre, giyayek e teybet ji bo berxa didûrîn. Wek heliz û kefak.
15 Ducanbûn, dema berx dikevîte zikê dayika xwe da.
16 Teremast cûrekê mastî ye, piştî meha îlonê digirin, di mencel û amanên mezina çêdiken, zivistanê wî mastî dixwen.
17 Da ku genim di bin axê da rihên xwebidet û şîn bît.

### 6. Zivistan

Zivistan bi meha Kanûna ewil destpê diket, heta bist û sêyî adarê dewam diket. Dema zivistanê destpê kir, divêt miştîya pêzî û hêywanan hazir bîken. Dîsa divêt dexl û dan û zimhêrê xelkê jî hazir bît.  Demsala zivistanê gelek hesab û qelpan di nav xwe da dihewîne. Hazirîya têtekirin hemî ji bo zivistanê ye. Ew kesê bihar û havîn û Payîzê şol nekiribîtin û kare xwe nekiri bîtin jîyana wî ya zivistanê de bi zehmet kevît û dê mexdûr bîtin.

#### 6.1. Kanûna ewil û Kanûna Dumahîyê

Zivistan Kanûna ewil destpê diket, her wesa yazdeyî Kanûna ewil serê miştê ye jî. Pez hêdî dikevîte dûnhê, neşêt ji derve biçerît. Hêdî dê bi wî gîyayî êtê xwedan kirin ew giyayê havînê hatîye dûrîn.

Her mihekê pênc piştîyan ji bo hazir diken, her piştîyek pênç texe ne, yazdeyî Kanûna ewil û heta avetîrk derbas dibin bîst û pênc texan ji bo mihekê hazir diken (Er, 2022).

Pîr dizanît ku dê befir barît, ev barane ya bê cih nîne û cihê befrê xweş dibît, can/genç jî dibêjin eve bihar hat.

Baranên mehên Kanûnan sebebê nexweşîya rewşa hewan e.
“Barana Kanûna

Girya pîra, keyfa cana têt” (Mengeş, 2022).



Herdû mehên kanûnan jî xweşî zêde ye, befir dibare û bager zêde heye, jiyana însan wek tarîyekê da derbas dibît.

“Kanûnê nekenîme
Befr û bager xerîme
Taryeke ji yêt qedîme” (Kizilkaya, 2022)

Hesabadarên hesaba Kurdî ji bo herdu kanûnan peyva “Befirbendê” bi kar înaye.

Dema yazde roj ji Befirbendê derbas bûn çile destpê diket. Ji bo herdu Kanûnan peyva “Rebandanê” jî bi kar înaye (Kızılkaya, 2022). Ji ber ku rê têne girtin, kesek neşet ji mala xwe derkevît û biçîte rêvingîyê, ji ber hindê gotînê rebendan. Bîst û pêncî Kanûna Dumahîyê Şevê Gelavêj e, roj dikevîte pişta Gelavêjê, piştî Gelavêjê meha şuwatê têt (Şen, 2022).

##### 6.1.1. Çile

Çile û beçe dikevine herdu Kanûnan da, çile bist roj jê Kanûna biçûk in, bîst roj jî ji Kanûna mezin in. Ji ber ku rojên Kanûna mezin ji rojên Kanûna biçûk direjtirin gotînê Kanûna mezin. Çile çil roj in. Ev çil roje zivistan zêde bi sir û seqem e.

“Çile sir û serma ye
Kuvan û êş û ta ye
Hewara Xudayê Mewla ye” (Kızılkaya, 2022).

Çile yazdeyî Kanûna ewil despê diket, bîst roj ji Kanûna ewil in, bist roj jî ji Kanûna dûmahîyê

ne. Dema çile çil roj xilasbûn, serma digehîte hedekê zêde, wî demî cihê deştê/çolê li Erebistanê jî, hind qeder germ zêde dibît. Ereb kûn û reşmal û çadiran diveden û diçine binda. Dîsa jî ji germa îdare naken. Erebên çolê serê çile berê kûnên xwe berêjêr diken. Lewra wê şevê ba/bager radibît. Ji ber hindê berê kûnê xwe dizivirînine rexê/alîyê qublê û kama/alîyê başûr, heta wê şevê pîrejînên Ereban heft caran kurê xwe yê êkane ji xwewê hişyar diken, da ku ava tezî vexwen, ji ber ku wî wextî paşve av wekî xwe namînît, seqayê avê dê şikêt û dê germ kevîte hewayî dê ber germe ve çît û av dê germ bît. Dema çile xilas dibît, "Pela bîyê" dikevît. Têhna pela bîyê kêm e. Bîyê diken nav agirî da têhn jê naçît, lewra dara bîyê bi av e, dema çile xilas bû germ wekî pela bîyê ye (Kızılkaya, 2022).

**6.1.2. Beçe**

Piştî çile beçe despê diket. Beçe jî bîst roj in, deh roj ji Kanûna Dumahîyê ne, deh roj jî ji meha Şuwatê ne. Çile û beçe gelek sar derbas dibîn. Sir û seqema beçeyî ji ya çile zêdetir e. Beçe dibêjît: "Heke min şerma birayê xwe yê mezin nekiriba, ez da berxê di zikê makê da qoç[18] kem". (Engin, 2022). Ku birayê mezin çileye, çil roje, beçe nîveka çileye, bîst roj in, ji ber hindê hurmeta çile digirît. Dema beçe xilas dibît, "Pela dîadarê" dikevît. Pela dîadarê bi têhn e, dehî şuwatê têhna germ xwe nîşa didet. Têhna pela dîadarê zêdetir e. Dema beçe xilasbû zivistana bi sir û seqem derbas dibît. Piştî hingê heta dehî meha nîsanê zivistan dewam diket. Ji ber hinde gotîne.

"Çil çilen e
Bîst beçen e
Hindî di jî hene" (Engin, 2022).

Li herêma Culemêrgê zivistan dirêj e. Di gotinên xwarê da îşaret daye sed û heşt rojan. Bes ev hejmare tête guhartin, me li jor ev behse kiribû. Zivistana herêmê ya herî sar çile û beçe ne, belê piştî çile û beçe jî zivistan dewam diket.

"Çil çilen e
Bîst beçe ne
Bîst di jî hene
Heft zîpîk
Heft xirîpik
Heft di jî nik
Heft di jî hene
Paşê şîndibin, xweş dibin, der dol û şivik.
Gayê xwe berde rûnexwarê nik" (Kızılkaya, 2022).

**6.1.3. Sezdêy Kanuna ewil**

Sêzdey Kanûna Ewil roj berê xwe didete havînê, şeva ji hemî şeva direjtir şeva sêzdeyî Kanûnê ye. Ji vê rojê paşve hêdî hêdî roj dê dirêj bîn û şev dê kurt bin.

Şeva sêzdêyî Kanûnê ker bi kerînîye xwe dizanît ku şev kurt dibin (Şen, 2022). ew gîyayê didanine ber kerî hemîyê naxwet, ji ber ku şev kurt dibin, ker gîyayê xwe xilas naket.

18 Qerisandin

"Sêzdey Kanûnê
Rojê berê xwe da havînê" (Şen, 2022).

**6.1.4. Bist û Çarî Kanûna Ewil**

Qelpeke zivistanê bîst û çarî Kanûna ewil e, dibêjine vê qelpê "Bêlda". Peyva belda bi zimanê suryanîyan e. Xelkê herêma Culemêrgê jî weki wan gotîyê belda. (Kızılkaya, 2022). Xelkê gelîyê tîyarê bêlda wek eydekê pîroz kirî ye. Li gelyê tîyarê jiyanek hevpar hebûye, fele û musliman li gel hev jîyan derbas kirîye. Çendan hewa germ jî bît, belda xwe ji alîyê sermaye ve diyar diket. Gelek caran heta şeva beldayê befir nehatîye, dema şeva belda digehîtê befir dibarît û rewşa hewa nexweş dibît. Ji ber hindê gotina xwarê li ser gotîne.

"Bêlda bendilxe
Heçî derkevît mala xwe
Bîte qatilê riha xwe"

**6.1.5. Heyhot**

Heyhot di zivistanê da qelpeka giran e. Befir dibarît û serma zêde dibît. Qelpa heyhotê dikevîte nîveka zivistanê. Herdû mehên befirbendê/Kanûn derbas dibin, du meh jî zivistan dimînin. Li gor efsanên di nav xelkê herêmê da şeva heyhotê Mem û Zîn çûne devêk[19] û gihiştine miraza xwe.

"Xidir Nebî Xidir Îlyas
Nîveka zivistanê xilas
Bo Mem û Zînan hasil bibû miraz"



Ev şevê nabeyna sih û sih û êkî Kanûna Dumahîyê ye, roja baştir serê meha Şuwatê ye. Hethot du roj Kanûna Dumahîyê ne, du roj jî ji meha şuwatê ne. Di vê şevê da gelek sar û sir û seqem zêde dibît. Ji bo ku mirov sirê neben îmkanên xwe hemîyan berxwe da diden û tiştên bi xwedî qîmet jî ji bo hindê xerç diken. Li gor rîvayetan Xelkê Xana Sêgundan[20] vê şevê da ji ber sir û seqemê qir bûne û vê şevê da gundê xwe berdayîne. Ji ber hindê dibêjine vê şevê "Şeva qirê" an jî "Şeva Rûmê" (Kızılkaya, 2022). Wê şevê rum/rim[21] li erdî dane, heta rum du metre bilind bûne. Serê rumê zengil êxistînê, şeva rumê hind qeder befir hatîye, ji ber hatina befrê dengê zengilê vemirandîye û hêdî deng ji zengilê nehatîye.

Heyhot rojên hin qeder bi hesab in, serma hind zêde dibît, da kû mirov mexdûr nebît diştên xwe yên gelek bi qîmet û kesên xwe yên xweş tivî jî di ber xwe da diden û mesref diken. Li herê-ma Çelê li ser heyhotan ev gotine hatîye gotin.

"Heyhot heyhot
Dayê kiç fîrot
Da bi kezan û kelot" (Ölmez, 2020).
Heyhot Heyhot
Jêk verestin mehên cot

19 Hatin cem yek.
20 Ew Xana Ehmedê Xan3i lê hatîye dinyayê.
21 Bi zimanê Tirkî mızrak e.

Ecêp dinya li ber nesot" (Kızılkaya, 2022).

Li şemizdîna jî wata vê gotînê eynî ye, bes gotinê da cudahîyet ketîyê. Li Çelê gotîye "babê kur firot", li Şemizdîna gotîye "Kerî hespê xwe firot".

Heyhote Heyhote
"Xilasîya herdu mehêt cotê
Kerî hespê xwe firote
Da takî dara ber eyalê xwe sote" (Şen, 2022).

Li Culemêrgê jî eynî gotin hatîye veguhastin. Gotîne "babê kur, daye kiç firotin".

"Heyhotin heyhotin
Jêk verestin mehên cotin
Babê kur firotin
Dane bi dar û dû sotin
Daye kiç firotin dane kil û kezan verotin" (Engin, 2020).
"Heyhot Heyhot
Babê kur firot
Da bi dar û sot" (Er, 2022).

Li Geverê jî ev gotine bi versîyonek din înane ziman. Sermaya heyhotan ketîye devê pîre jinan û pê ve gotîne.



"Heyhote heyhote
Pîrejina gote gote
Li me hatin herdû mehên cote
Ecêb dinya nesote" (Geverî, 2022).

Heyhot qelpeke wesa ya girane, sir û sermayek zêde dikevîte hewa û av û axê. Heke mirov mecbur bû heta dê kurê xwe jî firoşît ber xwe da bidet da ku ne telifît.

Li Dêr Zengilê felek hebû, di heyhotan da nava rojê hewa nexweş dibît, fele zengilekê bi serê darekê vediket û bi banê dêrê ve dihawîsît. Paşê gayekê serjê diket û goştê wî gayî dikete qelye. Kurên xwe rêdikete ser banî û heta siharê kûret fele befrê diavêjin. Zengila fele bi dêrê vekirî befir zevt diket, kurêt fele xeberî didene babê xwe, fele dibêjîte kurên xwe vê gavê divî gundî da çu kes nemaye, hemîyên bin befirê ketîn û yên mirîn (Ölmez, 2022).

**6.2. Şuwat**

Meha şuwatê mehek befrîne, befir zêde dibare, rê têne girtin, gelek caran ehle herêmê, gundî û rênçber di rêkanda mane asê û ketîne bin aşotê û hem mirov hem jî heywanên wan telifine.

"Şuwatê befr û ba tê
Befir hate nîveka latê" (Kızılkaya, 2022).

Dîsa derbarê barîna befra meha şuwatê da bi awayeke din husa înaye ziman. Befir wesa dibare kesek neşêt xebatê biket.

Şuwatê befr û ba tê
Mirov neşêt biket xebatê (Geverî, 2022).

Meha şuwatê lêbînok e, heft caran rovî dikete kunê ve û tînîte der. Hewa dibîte sahî/xweşî rovî tête ber tavê, hewa dibîte ewr/nexweşî rovî diçîte kuna xwe da, heta êvarê şuwat heft caran rovî dixwapînît. Ji ber hindê gotîne şuwat meheka xwapînok[22] e. Şuwatê hem girî hem kenî, hem şahî, hem şînî têda heye. Rovî bi rovîtiya xwe, bi hîle û hewalêt xwe ve neşêt ligel meha şuwatê sereder biket. Roja xilasîya şuwatê piştî nîvro dibêjin nîvek şuwat, nîvek adar, ew roja nîvî gîskqarên e, wê rojê gîsk diqarît, gîsk an birsî ye, an jî têr e, an jî keyfa wî xweş e, ji ber hindê diqare.

Di efsaneyên Kurdî de meha şuwatê çûrê[23] ji deştê têt. Çûrê rengê jinan didet. Dahmenêt wê li erdî dixwûşin, wê rojê da çûrê li ser gundan da dibôrît, hêkên marî bi dehmena wê hene, heke dahmena xwe berdete ser erdî, ew sal dê gelek germ bît, mar gelek hene, av û germ zêde heye, lewra mar ji hez germê diket, heke damanêt xwe ne berdan ew sal ne gelek germ û ne jî gelek jî av heye.

Meha şuwatê qelek qelp têda hene, di nav xelkê herêmê da gotîne şuwatê mehreşe/meha reş, lewra heke mirov gelek li ber tava heyva şuwatê rawestît rûyê mirovî li ber tava heyvê reş dîbît.

Sê salan meha şuwatê bîst û heşt roj in. Sala çarê meha şuwatê dibîte bîst û neh roj. Her salê şeş seet li meha şuwatê zêde dibin. Çar sala bîst û çar seet lê zêde dibin. Bi vî şiklî rojek li meha şuwatê zêde dibît û sala çare dibîte bîst û neh roj. Wê sala şuwat dibîte bîst û neh roj pîrejinek bizotekê di destê xwe digirît, pişt kaç û kulozan digêrînît û dibêjît: "Derkeve, derkeve, şuwatê derkeve, da bereket bêt" wê salê heke şuwat ji nav xelkê da derket, bereket dê êt, wê gavê şuwat û êş û elem di nav xwe da kirne der (Kızılkaya, 2022).



**6.2.1. Sêzdeyî şuwatê**

Sêzdeyî şuwatê "Pela Kezanê" ye. Pela kezanê têhn vedidet, çardeyî şuwatê heywan û teyr û tewal keyfxweş dibîn. Heta wî demî bum naxwûnît, bum çardey şuwatê dest bi xwandinê diket. Çardeyî şuwatê av zêde dibît, bilq bilq ji avê têt, av qat qat zêde dibît.

"Çardeh şuwatê
Bum dixwûnît latê
Se xwe didete siha kêratê
Ema li hêre ne li gelyê Tokatê
Kef kefên qatê qatê" (Kızılkaya, 2022).

**6.2.2. Cemre**

Beçe deh roj ji Kanûna dûmahîyê ne, deh roj jî ji meha şuwatê ne. Dema beçe xilasbû "Qere Şuwat" destpê diket. Piştî qere şuwat xilas dibît, cemre destpê diken. "Pît û Pal û Xem û Meryem" ew jî Gelavêj e, heke pîtî rît, ewe rît, heke pîtî nerît, salê palê xwe da, eve jî roja Gelavêjê ye, "Xem" cemrê hewaye, "Meryem" ketina cemre û şikestina hewa ye. Heke cemre şkest hewa, av û ax germ dibin. Hêdî cemed naçêbît, ax û cemed jêkve dibin û av dê bin cemedê kevîtin.

22 Hîle lê kirin, serda birin û xirandin.
23 Çûrê di efsanan da rengê jinan didek.

Cemrê ewil bîstî şuwatê dikevît. Diketina wextê cemre da jî hesapdar agahîyê cûda diden. Her sê cemre di meha şuwatê da dikevin. (Engin, 2020) Cemre bîst û yek roj in û sê heftî ne. Heftîya ewil cemre dikevîte hewa, heftîya duyê cemre dikevîte avê û heftîya sêyê jî cemre dikevîte axê. "Qerasê axê" jêkvet bît û cemed dihelît. Germahîya li bin erdî ser erdî dikevît û rewşa hewa germ dibît. Hewa, av û erd diqerimtîn e, dema cemre ketin, hêdî dihelin. Ketina cemran nîşanêt biharê ne.

**6.2.3. Agirê Fele**

Agirê Fele jî dikevîte nabeyna cemrê hewa û cemrê avê da. Li gor rîwayetan kurê fele ji bo xebatê diçîte mezra, wê rojê dibîte firtone, barove, nexweşî û befrek zêde dibare. Kurê fele neşêt bi zivirîte mala xwe, dema fele dît kurê wî nehatîye mal, radibît agirekê hildiket û kurên xwe yên din jî rêdikete ser banî da befrê temiz biken û da kurê wî li mezra bibînit ku birayên wî yên şol diken, da ew ji xwe bi şolî ve gîro biket û da canê xwe ji dest nedet. Ev agire hosa bo îşaret di nabeyna fele û kurê wî da.

**6.2.4. Zîpe**

Heftîya dûmahîya şuwatê roja çarşembî zîpe destpê diken. Zîpe heşt roj in, nabe ku zîpe hemî di meha şuwatê de bin. Çar roj dikevine dawîya meha şuwatê û çar roj jî dikevine destpêka meha adarê. Divê du çarşembî ber zîpa bikevin, çerşembîya dawîya meha şuwatê û çarşembîya serê meha adarê. Hindek caran rojek jî şuwat dimînît, zîpe destpê diken, bist û heştî şuwatê dibîte zîpe. Divêt zîpe herdu meha bidete ligelêk. Yanî di herdû mehan da derbas bibît. Zîpe di kevneşopîya Kurdan de gelek cihek girîng digire. Dema zîpe destpê kir, bager/hureba radibît, seqayê hewa gelek sar dibît. Derheqê zîpan da pîremêr û pîrejinan gotinên hosa jî gotîne. "Dinya di zîpanda ava bûye û dê di zîpanda jî xirab bibît".



Xelkê herêmê di zîpan da darek sê çiqil çêdikirin, digotinê: "Dara zîpe". Her çiqilekê kaxezek nexşandî têxistê/pêve dikir. Da wê dara zîpe dene ber ba/bagerê. Vêca ba ew dara zîpe da zivirînît, deng ji wî darî dihat û kur û kiçan bi vî şiklî keyf dikir. Heke di zîpe da baran barî dê bihar zû êt û dê bîte xweşî. Heke di zîpe da baran nebarî bihar zû naêt û hewa dê hişkesal derbas bît. Heke zîpe para zêde di meha şuwatê de bît, ew sal dê adar bi nexweşî derbas bît. Heke zîpe pitir di meha adarê da bin ew sal dê bi xweşî derbas bît û dê berbiharê ve çît. Zîpe di cihê xwe da namînin tên û diçîn (Kızılkaya, 2022).

Heke di zîpe da barî bihar dê zû destpê ket, heke di zîpe da ne barî Semedar e. Semedar navê cihekî çiyayî ye, di kevîte nabeyna Tuxwîb û Gelyê Tîyarê. Ji ber ku cihekî bi serma ye, gotîne heke nebare Semedar e.

"Zîpe zîpe dar e  
Heke barî bihar e  
Heke nebarî Semedar e" (Kızılkaya, 2022).

Zîpê ewil xelkê herêmê kelepaçe çêdikirin, di zîpa dûmahîyê da jî birinç çêdikirin û hêke dikalandin. Genç û tolazan hêkanê dikirin, girar çêdikirin û diçûne cihên reş û belek keyf dikirin. Dîsa dema zîpe dihatin kurya dewaran dibirîn, pez gîncî dikirin, berx dûrî dikirin û heywan mehs

dikirin (Er, 2022). Ew kesên kiçên xwe didane şû ew gazî malê dikirin û zad çêdikirin û xelat didanê û pirça biçûkan dibirîn. (Korkmaz, 2018). Dema zîpe digehinê befir ser erdî û bin erdî wekî yek dihelît. Ji ber ku germ dikevîte axê, binê axê xûlûle dibît, ser û bin wekî yek dihelîn.

Li gor hindek hesabdaran dema nevrozê destpê kir, wê rojê zîpe jî destpê diken. Bes ev hesabe di herêmê da gele ya belav nîne. Hesaba li herêmê belav zîpe di dawîya şuwat û destpêka adarê da ne. Ew ji me li jor behs jê kir.

Di zîpe da bibarit an jî nebarît serma her ya hey, yanî sermaya zîpa bi barînê ve girêdayî nîne.

"Zîpen e zîpedar in
Barin nebarin het sar in

Yêt kiçkê neyar in" (Şen, 2022).

Destpêka zîpan da bayeke/bagerek sar radibîtin, dema zîpe geheştinê ava befrê dihelît û dikevîte nav ava rûbarî, kew li Badînan wê avê vedixwet, hêdî kew dizanît bihar hat, vêca berê xwe didet zozana, wî deme salê xelkê telqe çêdikirin da kewan bigrin (Şen, 2022)

**Encam**

Her milletêkê çalakîyên xwe yên civakî, aborî li gor teqwîmekê bi cih înayîne. Hindek millet li dûv teqwîma hicrî, hindek millet jî li dûv teqwîma Rûmî çûne. Kurdan teqwîma Rûmî bi kar înane, bes heman demê da Kurdan li gor hesaba miştê hesaba xwe kirîne. Ev hesabe jî hesabadarên hesaba Kurdî li gor teybetmendîyên erdnigarîya xwe girtîne û çavdêrî û tecrûbeyên xwe bi devkî veguhastîne. Rewşa hewa û qelpên zivistanê, wextê çandinîyê, malbarkirin û çalakîyên aborî û rênçberîyê bi hîşyarî hesab kirîne. Her wesa derheqê vê hesabê da di nav xelkê da edebîyateke devkî jî ava bûye. Li ser van gelp û kulîpan da gelek gotin hatîne veguhastin. Dîsa li ser demsal û mehan da gotinên mezinan cihekî girîng girtîye.

Xelkê gundan serê biharê diçîte berbiharê, berbihar wextêkê kurt e, dema ziviztan xilas dibît alif namînin bidene pêzî, ji ber hindê diçine wan cihên bihar zû têtê da pezê xwe xwedan biken. Piştî hingê diçine zozanan li ber hewayê hûn da pezê xwe xwedan biken. Xelkê herêmê havînê mal bar dikirin û diçûne zozanan, koçer jî wî wextî ji deştê diêne zozanan da pezê xwe xwedan biken. Payîz wextê giyakêşanê, gêrekirin, dar komkirinê ye. Ev bizave hemî ji bo zivistanê ye, da kû zivistana dûr û dirêj, şevêt tarî, sir û seqem, li cihên dûr û deraz, nemînine bê dexl û dan û bê alif û bê debare. Zivistan roj bi roj hesab dikirin û li gor hindê ji bo pez û hêwanêt xwe amadehî dikirin. Ew kesên bi vî şiklî xwe pêk neînin û kar û barê xwe neken, nîveka zivistanê pezê wî dê bimîne bê alif, hingê gundî da pezê wî kesî li mala belav diken, her gundîyek dê pezekê kete nav pezê xwe, hosa harîkarîya wî kesî diken. Alif û debarê û zimhêrê zivistanê rêkûpêk bi cih tînin. Divêt kêmasî nekevîte debarê, heke bê sebep kêmasî bikevîte zimhêr û debarê, eve ji bo wî kesî wek eybekê mezin e. Lewra ew kes dibîte sebêbê mexdûrîyeta mala xwe. Heke mal ya xwedan zelam bît, kar û barê zivistanê bêkêmasî pêk tînîn, ji ber hindê ji bo ehlê gundan kuran qîmetek zêde heye, lewra kiç neşên şolê cotyarî û gîyadûyrînê û rênçberîyê biken. Qedrê didene kuran jî sebebekê civak û aborî ye, ne sebebêkê ontolojîk/hebûnê bû. Ew kesên êkmêr[24] bin, şolên wan baş

24 Ew kesên ku di mala xwe da bi tenê, çi kur an jî bira nebin, karê malê hemî dimînîte bi hîvîya wî ve, ji ber hindê gotînê êkmêr.

naqetin gelek caran gundî harîkarîya wan diken.

Payîz wextê wergirtina hasilatê ye, ew kesên hazirîya xwe nekiribît û Payîzê hasilata xwe newergirît, dê zivistanê mexdûr bît. Dê pez û hewanêt wî mînine bê alif. Ji ber wê yekê hewce bû ku herkesek li gor vê teqwîmê hazirîya xwe biket û kêmasîyê neêxîte di şolê xwe da. Da bişêt jîyana xwe derbas biket û muhtacî kesê nebît.

**Çavkanî**

Kaplan, Y. (2015). Kanîya Stranan. İstanbul: Nûbîhar Yayınları.

Korkmaz, E. (2018). Hakkâri İlinde Halk Takvimi ve Sosyo-Ekonomik Etkileri. Van: Uluslararası Ahtamara Sosyal Bilimler Kongresi.

Çavkanîyên Devkî

ÇD-1: Hüseyin Ölmez (90 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 21.01.2020, Çel/Culemêrg.

ÇD-2: Abdülkadir Kızılkaya (75 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 07.04.2022, Culemêrg.

ÇD-3: İzettin Seven (55 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 17.09.2022, Van.

ÇD-4: Ramazan Engin (55 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 20.02.2020, Culemêrg.

ÇD-5: Elif Engin (50 salî/jin), Deman Hevdîtinê: 11.07.2022, Culemêrg.

ÇD-6: Fekî Mengeş (60 salî/mêr), Deman Hevdîtinê: 08.08.2022, Gever/Culemêrg.

ÇD-7: Mühacir Şen (58 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 23.07.2022, Gever/Culemêrg.

ÇD-8: Salahattin Geverî (65 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 03.10.2022, Gever/Culemêrg.

ÇD-9: Tahir Demir (61 sali/mêr), Dema Hevdîtinê: 24.06.2022, Culemêrg.

ÇD-10: Turan Şimşek (48 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 27.09.2022, Culemêrg.

ÇD-11: Ömer Er (63 salî/mêr), Dema Hevdîtinê: 03.06.2021, Culemêrg.